# TIMA

Du gundîê me linga ji Gumrîê tên. Yek emirda mezin bûye, yê din cahil bûye. Havîn bûye. Herdu jî birçî bûne. Nêzîkî gundê Poştê dibin. Yê emirda mezin dibêje yê cahil:

- Vî gundîda merivekî minî nas heye. Em herin mala wî, parî nan bixun, paşê herin.

Têne gund. Diçin ber derê ewî nasê xwe.

Nîvro bûye. Pez hatye dena. Weke sed mî hewşêda bûne, çend kulfeta pez dotine. Silavê didin malxuê malê û diçine hundur. Hal-hewalê hev dipirsin, hevekî hevra qise dikin, paşê malxuê malê baxşandinê dixweze, dertê derva.

Xêlelkê şûnda kulfeteke cahil şeşe nan tîne, datîne ser text, paşê diçe dodeke terikî tijî dew dike, tîne, datîne ber wan. Piç’e-piç’a dêw bûye, tirş bûye.

Malxuê dibêje mêvana:

- De keremkin, nanê xwe bixun.

Herdu mêvan ç’evê hev dinihêrin. Yê emirda mezin dibêje yê cahil:

- Kuro, nan hûrkê.

Herdu ewqas nan hûrdikin, dikine dodê, wekî dod t’ijî dibe. Yê emirda mezin kevç’îê xwe orta dodêda dike, kevç’î t’îk disekine, û dibêje yê cahil:

- De rave, em herin.

Malxuê divê:

- Hûnê kuda herin? Nanê xwe bixun!

- Bira mala te şênbe, - yê emirda mezin dibêje malxuê, - hertim havînê dewê tirş mala te kêm nebe. Te anye vê havînê, vê germê ev dewê tirş danye ber me û dibêjî bixun? Malava, ev hebûna te têra gundekî dike. Te qe na bigota, bira çend hêk têkrana hêrûn, banyana ber me! Hêk jî mala teda tunebûn? Ne dora malê tijî dîk-mirîşk bûn. Tu ber çend hêka jî ketî?

- Wekî we nedixwar, çira ewqas nan hûrkire nava dêw? – malxuê bi keder gote yê emirda mezin.

- Min qestîka usa kir, wekî qe na hevekî zyanê bidim te bona tu zanibî havînê tenê dewê tirş danaynin ber mêvana, - û vegerya ser yê cahil, gotê: - Rabe, hela zûye em ji vê malê herin.

Û herdua qe na xatirê xwe jî ji malxuê nexwestin, dêrîva derketin, çûn.